# سەردەمی نوێ

رۆژنامەیەکی سیاسی - فەرهەنگی کۆمەلایەتیە

ساڵی سێیەم   ژمارە ٢٨   بانەمەڕ - مای ١٩٨٨   نرخی ١٠ کرۆنە


لەم ژمارەدا :


- قەلاچۆ کردن بە بارمەتی ئەلمان
- یادی دوو تێکۆشەری ئازادیخوازی کورد
- کوردستان لە چاپەمەنیەکاندا
- چارەسەرکردنی سیاسی مەسەلەی ئەفغانستان
- دەنگدانەوەی جینایەتی بەعس لە هەلەبجە
- گۆشەی ئەدەب : رەومز وورد تابی
- چەپلە رێزان بۆ هونەرمەندی لاوی کورد گۆران
- دوا هەوال


## نامەیەکی کراوە بۆسەرۆکەکانی یەکێتی سۆڤیەت و ئەمریکا

**بۆ بەرێزان میخائیل گوربەچۆف سکرتێری گشتی کۆمیتەی ناوەندی حیزبی کۆموونیستی یەکیتی سۆڤیێتی، رۆنالد رێگان سەرکۆماری ولاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکای شیمالی**

لەگەل رێزوسلاو . ئێمە هێندێ لە نووسەر و شاعیر و زانا و هونەرمەند و رۆژنامە نووسی کورد لە دەرەوەی ولات، لە سەر و بەندی کۆبوونەوەی ئێوەدا وەك دوو هێزی مەزنی جیهانی، بە پێویستمان زانی لەم دەرفەتە کەلك وەربگرین و سەرنجی ئێوە بۆ بار و دوخی ئیبرەی ئەم رۆی کوردستان رابکێشین. پێویست ناکا بەسەرهاتی رابردووی کوردستان و خەباتی گەلی کورد بە درێژی لێرەدا باس بکەین ، خەباتی میللەتێك کە پتر لە سەد ساڵە لە پێناو ئازادی و ژیانێکی سەربەخۆ وهێمنانەدا قوربانی دەدا . بەلام زۆر پێویستە وەزعی داخداری ئێستای کورد وسیاسەتی حکومەتەکانی تورکیا وئێران و عێراقتان بە کورتی بخەینە بەر چاو ،

نەتەوەی کورد کە خەلکەکەی لە ٢٠ ملیۆن پترە ،بەگشتی کەوتوتە بەر پەلاماری تواندنەوە ولەبەین چوون . پتر لە ١٠ ملیۆن لە کوردستانی تورکیا لەهەموو مافێکی نەتەوایەتی بێ بەشکراوە وحاشالەبوونی دەکرێ.

حکومەتی تورکیا بە گواستنەوەی کوردەکان وچۆل کردنی کوردستان، دەیەوی شوێنەواری رەگەزی و نەتەوەیی کورد کوێرکاتەوە . بە هەزاران ئازادیخوازی کورد لە بەندیخانەکانی تورکیا دا لە ژێر ئەشکەنجە و ئازاردان.

بۆ لاپەری ٢

## کوشتاری بە کۆمەل و بێ دەنگی

نووسینی: جەمشید حەیدەری



لە کاتێکدا کە گەلی کورد ،لەهەموو پارچەکانی کوردستان خۆی ئامادە دەکرد بۆپێشوازی جێژنی نەتەوەیی خۆی نەوروز، دەنگوباسێکی دلتەزێن لە کوردستانەوە رایگەیاند کە رژێمی فاشیستی بەعسی عێراق لە ١٦ی ئادارد ا ، دوای هێرشی رژێمی ئێران بە هەرێمی ئاخوندەکانی ئێران بۆ کوردستان و داگیرکردنی شارەکانی خورمال و هەلەبجە، ناوچەکەی بەچەکی کیمیاوی و گازی ژاراوی بۆمباران کردوە.

ئەوجاری یەکەم نیە کە رژێمی بەعس چەکی کیمیاوی لە کوردستان بەکار دەهێنێ لە ١ ئاوریلی ١٩٨٧دا حکومەتی عێراق بە سەجەوانەی هەموو یاساکانی نێو نەتەوەیی ئەو چەکە کوشندەی نەك هەر دژی هێزەکانی ئێران وتار و گوندەکانی ئێران بەکار

بۆ لاپەری ٦

## شەری وێرانکەری ئێران و عێراق

نووسینی : مەهاباد کوردی

جەنگی ئێران و عێراق یا جەنگی قەلاچۆکردنی کورد !

ئاشکرایە کە شەر بەرزترین وبالاترین شێوەی بەربەرەکانی و ناکوکیە کە نەتوانری بەرێگای سیاسیانەو ئاشتیانە دا چارەسەر بکری . هەر شەرێکی کە روو بدا سیاسەت و پیلانێکی پێشەکی بۆ ساز دراوەو نەخشەی بۆ کێشراوە. هەر وەك مانوئەسەوونك دەڵێ: " شەر سیاسەتە بە خوێن رشتنەوە ، سیاسەتیش شەرە بە بێ خوێن رشتن " . هەلبەت جەنگیش کۆتاییەکەی هەر لە ناو بردنی مروڤ و نەگبەتی یە .

شەری ئێران و عێراق کە بەشیوەیەکی رەسمی لە بیست و دووی ئەیلولی ساڵی ١٩٨٠ هەلگیرسا ،بوو بە هۆی زیانێکی زۆری سەر دوولا لە باری ئینسانی و ئابووری و کۆمەلایەتی و ... هتد .

هەزاران کەسی بێ تاوان بوونەخۆراکی گوللە توپ و خولە میشی شا . سەدان گوندو شار کاول کران، هەزاران مروڤ پەك کەوتەو دەربەدەرو ئاوارە بوون، تێك چوونی باری ئابووری هەر دوو ولات وای لێ هاتوە کە پاش شەریش شوێنەوارەکانی بر بوونەوەی زەحمەتە .

بۆ لاپەری ٥

## یەکی ئەیار لە کرێکارانی جیهان پیرۆز بێ

ساڵی ١٨٨٦ کرێکارانی ئەمریکا لە (١)ی ئایاردا ، لە شاری شیکاگو بۆ وەدەست هێنانی مافەکانیان و کەم کردنەوەی کاتی کار کردن بۆ هەشت سەعات کار لە رۆژدا ، خۆ پێشاندانێکی گەورەیان ساز کرد کە لە لایەن پولیسی ئەمریکاوە لە خوێن دا نوقم کرا . لە ساڵی ١٨٨٩ وە بە یادی گوزراوەکانی ئەم خۆ پێشاندانە ، هەموو ساڵی کرێکارانی جیهان دەست لە کار هەلدەگرن و یادی ئەو رۆژە دەکەنەوەو ئەو رۆژە بە جێژنی کرێکاران ناسراوە .

کرێکاران و زەحمەتکێشانی کوردیش کە ئەمرۆکە کەوتوونە بەر زەبرو زەنگی سیاسەتی رژێمە دیکتاتور و کۆنە پەرستەکان، لەو هەل و مەرجە تال و دژوارەشدا شانبەشانی کرێکاران و زەحمەتکێشانی ولاتانی دراوسێ، بۆ وەدەست هێنانی مافی رەوایان و بۆ روخاندنی ئەو رژێمانە خەبات دەکەن .

کرێکاران و زەحمەتکێشانی کورد لە بزووتنەوەی رزگاریخوازی کورددا ، دەوری خۆیان دەبینن و شان بەشانی هەموو چین و تاقمی نەتەوەکەمان، بۆ ئازادی کوردستان و نەهێشتنی چەوسانەوەو ملهوری تێدە کۆشن .

بۆ لاپەری ٨

# گۆشەی ئەدەب

## چەپلە ریزان بۆ هونەرمەندی لاوی کورد «گۆران»

رۆژنامەی مـلادا فرۆنتا "ئۆرگانــی ناوەندی یەکێتی لاوانی سۆسیالیستـی چکوسلوسلوڤاکیا لە ژمارەی ٣٥ی رۆژی ١٩٨٨/٢/١٢ وتو ویژیکی لەگەل "گوران شیخ" خوێندکارو گۆرانی بێژی کــورد بلاو کردۆتەوە کە سەر کەوتنی ئاواز و موسیقای کورد و هەروەها لێی هاتویـی هونەرمەندی کورد "گواران" نیشان‌ەدا.

بە دوای ئەم گۆرانیەدا رۆژنامـــە نووسەکان چەند وتوویژی چاپەمەنیـان لەگەل گۆران کرد. تەلەویزیونی پراگ بە نیشان دانی وێنەی گۆران و هەلسەنگاندنی گۆرانیەکانی نرخێکی تەواوی دا بـــە گۆرانی و ئاواز و موسیقای کوردی. جاریکی تر ئاواز و شیعرو موسیقـای کوردی بە هۆی گۆرانی خوێندکارو هونەرمەند




سەربەرشتی دەکرد. کاتێك گوران چوە سەر شانۆ بە گۆرانی ..

وون کەن لەبەر چاو دوژمنی فاشی

وون کەن لەبەرچاو نوکەری و جاشی

من حەز ئەکەم کاتی شەهید بوونم

بە خوێنی سوور رێگای ئازی بۆکورد بنەخشێنـــــم

بە جارێك مەیدانی فێستیوالی لەرزاندو چەپلە ریزان و هورای دەستخۆشانە دەنگی دایەوە. بێجگە لە پێشوازی گەرمـــی کۆمەلانی خەلك و چەپلە لێدان بۆ گوران، ئیڤان خۆخۆلۆش ئەندامی کومیتـــەی ناوەندی یەکێتی لاوانی سوسیالیستـی چکوسلوڤاکیا لە هەلسەنگاندن و بەراورد کردنی فێستیوالی ئەو سال و رابـردوودا دەیبژی: "شادو کامەرانم کە بەگشتـی هونەرمەندە بێگانەکانی ئەم سال بەشداری‌یان کردوە زۆر لە بار باشتر بوون. بـە تایبەت گۆرانی بێژی کورد گۆران هـەر وەك سەر چاوەی کانێکی ئاوی پاك کـە شادی تێدا دەتروشایەوە هێنایە سەرشانۆ بۆیە دەلێم ئەم سال پلەی هونەری فێستیوال لە پار بەرزترە".

و نیشتمانپەروەری کوردەوە خۆی بە گەلانی جیهان ناساند.

ئێمە بۆ گۆرانی هونەرمەند لە خزمەت بە کولتورو ئاوازو گۆرانی کوردی داوای سەرکەوتنی بۆ دەکەین.

یەکێتی لاوانی سوسیالیستـــی چکوسلوڤاکیا هەموو سالی لەمانگـــی رێبەندان دا فێستیوالێکی گورانی سیاسی جیهانی لە پێناو ئاشتی و ئازادی گەلا ن و نەهێشتنی چەك و فر کردنی مرۆڤایەتی پێك دێنێ. لەو فێستیوالەدا تیپی موسیقا و گۆرانی بێژو هونەرمەندی ولاتانی جۆر بە جۆر بەشداری دەکەن و گۆرانی سیاسی و ئاشتی و ئازادی دەلێن. فێستیوالی ئەو سال لە رۆژەکانی ١٠ تا ١٤ ی مانگـــی فوریە بە بۆنەی ٤٠ سالەی ئازادی چکو ـ سلوڤاکیاوە گرینگی پتری پێ‌درابوو. هونەرمەندی کورد گوران لە گەل تیپی موسیقای "بلکانتۆ" کە ئارام دیـلان کوری هونەرمەندی بەناوبانگ و ماموستای موسیقاو ئاوازی کوردی قادردیـلان

## رەوەز ورد نابێ

بەستە شیعریکە بە بۆنەی یادی دەسالەی شەهید بوونـی سولەیمانی موعینی ـ یەوە لە مەهاباد لە لایەن شاعیری مەزنـی کورد هێمن خوێندرایەوە.

زەوی ئێستاش لە رووت هەل دێ بدەی سـور
تەرووخای ئاسمانی پیری پشت کـــوور
کە حالی زارمان ئاوا دەبینـــن
کەسالی زالمان ئـاوا دەبینـــن
کە مەرگی لاوەکانـی چاك دەبینـــن
کە جەرگی کیژەکان پر چاك دەبینـــن
کە کۆری شیـن، بەهاری سـوور دەبینـن
"ئەمین" ی نا ئەمین مەشموور دەبینـــن
کە بووکی سووری بێ زاوا دەبینـــن
کـرووزەی بێ گونای ساوا دەبینـــن
کە سۆمایی لە چاو باوکان بـــراوە
بەروکی پیرە دایکـــان دادراوە
کە کوندی شوم لە گوندی کورد دەخوێنـــێ
کە گەنجی کورد دەگەوزێنێ دەخوێنـــێ
کە تەختی بەختی کورد بێ خێو دەبینـــن
"سولەیمانی" ئەسیری دێـو دەبینـــن
بناری لێژو ناهەمواری هەلگـــورد
دەبینـن بۆتە دەشتـی کەربەلای کـــورد
بەنا هەق خوێنی تیکۆشەر دەرێـــژن
شەهیدی بێ سەر و بێ شوێـن نەبێژن
بەلام با تێ بگا ئەو دوژمنەی پەســت
رەوەز ورد ناکــری هەرگیز بە داردەست
دەبێ گوند هەر بەرەو وێرانە بفـــری
هـەلۆ لەو کێوە سەربەرزانە نەبـــرێ

پاشماوەی لاپەرەی ١

### یەکی ئەیار لە کریکارانی جیهان پیرۆز بێ

بێگومان کریکاران و زەحمەتکێشانـی کوردستان ،لە ژێر بۆمبارانی شار وگوندو لە چیا و چۆل و لە سەنگەریزی شەرەفیش دا یادی ئەو رۆژە دەکەنەوە و دەنگی خۆیان لە گەل دەنگی کریکارانی جیهان یـــو یەکگرتن و بە دەنگی یەکترەوە هاتن بەرز دەکەنەوە. پاش ئەم جنایەتەی کە حکومەتی خوێن ریژی بەغدا کردی لە هەلەبجە و هیروشیمایەکی تری لە کوردستان دروست کرد، یەکی شعاری ئەمسال ئەو ئەرکـــە دەخاتە سەر ئەستۆی کریکارانی جیهان کە جنایەتی رێژیمی عیراق مەحکوم بکەن و پشتگیری خۆیان لە خەباتی رەوای گەلـــی کورد رابگەیێنن.

سەرکەوتوو بێ خەباتی کریکاران و زەحمەتکێشان لە جیهان دا.

پاشماوەی لاپەرەی ٣

### یادی پیرۆزی دوو تیکۆشەری ئازادیخوازی کورد

بەم جورە چرای تەمەنی کورت و پرلە ئاناری دوو لاوی خەباتگێرو نیشتمانپەروەر و گەلێك لە هاڤالانیان کوژایەوە و جولانەوەی سالەکانی (٦٧ ـ ٦٨ ١٩) کوردستانی ئێرانیش بە شەهید بوونی ئەوان وکۆ مەلێك لە ئازادیخوازانی کورد کۆتایی پێ هات و دەرسێکی بە نرخی بۆ جولانەوەی رزگاریخوازی کورد بە جێ هێشت.

لە یادی ٢٠ سالەی شەهید بوونی سمایل و سولەیمان و هاوالەکانیان دا، وێرای سەر دانواندن لە بەرامبەر فیداکاریاندا، بۆ گیانی پاکی گشت شەهیدانی رێگای ئازادی کورد و گەلانی دیکەی ئازادیخواز سلاو دەنێرین.

هەواڵنامەی کتێب

Ji rupel 1

## AXIVTINA BÊ MESOLIYET

halê wan xweş bibe"?! Evca eger Xumênî ji nuha her ew divê hakimiya Îslemê biser Kurdistanê de da dene.

Sala 1979 an Îsmat Şerîf Xumênî ditiye, nuhe ew jêre piropagende dike "Eger kurd îslamê qebûl bikin ...." Bêgoman ger wî ev sal seredena wî bi nesîb baye, Kurdistan dikire beheşt û pasder ji dikirin firîstê (melaîket).

Pirofîsor Îsmat Şerîf ku li Ewrupa rûdine, bivî awayî serûberê kurdên li Îranê bo rojnama biyanî ron dike !!

Hizba demokrata Kurdistana Îranê ji meydana xebatê de ye û di rojnama (Kurdistan) hejmara 132 an de dinivise:-

Lêxistina xelkê bê desthilat, bumbarana bajar û gundên Kurdistanê û kavilkirina hezaran xaniyen biser xwediyê wan de, koştina jin û zaru û pîr û kalên kurd, girtin û Îşkencedana lawên kurd û malixkirina abûrê, pişkeke ji karê rojane yê rijêma Xumênî. Wêrankirina gundên Kurdistanê û derbiderkirina xelkê bê guneh li Kurdistanê ji layê rijêma Îslamî ve her dom dike. Di mehên bûrî de, li navça (devera) Serdeştê karbidestên rijêmê bala xelkê 24 gundan kêşaye ku ew gundên xwe çol bikin. Di nav wan 24 gundan de 779 binemal hene ku hejmara xelkê wan dibê 3895 kes. Jibili wan, di mehên bûri de hikmeta Îslamî li devera Serdêşt 10 gund şewitandine û xelkên wan derbider kirine. Ewe ji navên wan gundane :- "Xwarmê, Delalan, Têyeta jorî, Têyeta jêrî, Birdan, Zengelênan, Pilekan, Zerdekana jêrî, Zerdekana jorî"

De bila xwîndevan bixwe gotinên Îsmet Şerîf û nivîsîne rojnama (Kurdistan) berhevdu bike û bizane ku kurdan çi devrast hene û bi çarenivîsa kurdan dileyzin!

Ji bo agadariya Dr. Îsmat Şerîf gerek em bêjin, ku ewên gund û malên wan kavil dibin û kavil bûne û wan ji ser axa bab û kalên wan diguhêzin, ji mêje ew Îslamin û ji Xumênî û Dr. Îsmat ji musilman tirin. Tiştê ecêb ewe ku Dr. Îsmat Şerîf bi xwe ji Suryê ye û behsa Kurdên Suriya nake. Lê ew ji nik xwe behsa Kurdistana Îranê dike bêy ku haya wî ji Serûberên nuha yên Kurdistanê hebe.

Em dibêjin ku ev axiftina bê mesoliyet listike yan henek kirine bixwîna hizareha Şehîdên ku giyanê xwe gorî (qurbanî) rizgarî û serfrazbûna netewa xwe kirine. ✱

J rupel 1

## ÇARESER KIRINA SIYASÎ

ku têkilî karên Afganistan û Pakistan nabin.

Rêz li bendên qerre bigirin û ji bo zivrîna mişextan, ew alîkarî bikin. Di we qerardadê de gotiye i dewletên Afganistan û Pakistan bibev hatine ku rê bidin ew Afganî yên ku bo demê kurt li pakistanê dijin, bo welat bizivrin. Dewleta Afganistan, tev alîkariyan ji bo zivrîna mişextan amade bike. Dîsa dewleta Pakistan ji gerek ji bo zivrîna dilxwaza rêkupêk penaberên (multtece) Afganî hemî alîkariya bike û rêyan xweşke.

Sekretere giştî ye navnetew, nûnerekî xwe ji çavdêriya bi cêh anîna naveroka qerare.

Qerardada Afganistan û Pakistan di roja 15 may de di keve kar û her wê rojê hêzên Sovyet we dest bi zivrîna xwe bikin bo welatê xwe.

Ew qerar ger serok û derebeg û kevneperestên revî yên Afganî û handan û aloz kirina Iran û Emrika lê bigerin, rê ji bo tenahî û aştiyê û ne mana şerê birakujî xweş kiriye. Xelkê Afganistan bi hukmeta xwe ya millî ve wê karibe birînên xwe yên 8 salan derman bike û rêya jiyaneke tena û pir aştî û bextiyar dante ber xwe.

Lê gotinên serokên kevneperest û reviyên Afganistanê yên ku man xwe di şer de dibînin û dîsa gotinên wezîre derve ye Emrika li ser alîkariyên eskerî ji bo caşên Afganî, ew kor û komelên aştîxwazên severê neçar dikin ku aştî û tenahî ji bo Efganistan ne ziurîte ve. ✱

J rupel 2

## JI KANIYA FOLKLORA

Dibêjê:

Dê deme te heft gunda
di gel heft barî zêra
Dê te keme maqûl liser dwazde bajêra.
Ezê Xatûn Xezalê keme seneme
Mecidiyan û zêra
Hema tu qewl û qirare xwe bidey ji
Elî Begê re
Çi subeye, sube zûye
(Hesen paşa) qesta aliye Xatûn Herêma Kiriye
(Xatûn Xezal) di ber ve hat û di bêjêt:
Babo, eve çi sehyan û qerebaliqe li koçkê ronîştî ye ?
Di bêjê, ma tu nizanî ?
Elî Begê Kela Şulhayê dewletê
Bi tabûr û eskerê nîzama tirkare hat û
Bi qedrê Xudê Xwazgînîne.
Dê dete min heft gundan di gel heft barî zêra
Dê min kete maqûl li ser dwazde bajêra
Ewî sûnda xwarî dê te kete seneme mecidiyan û Zêra
Hema tu qewl û qirqe xwe bidey
bi Elî Begê kela Sulhayê ra.
Xatûn Xezala di bêjêt:
Babo, min navê
Bila ne dete te heft gunda digel heft barî zêra
Bila te nekete maqûl li ser dwazde bajêra
Bila min ne kete senemê mecidiyan û zêra
Ma tu nizanî, min qewl û qirare xwe dane
ji pismamê xwe ra
Dilêrê pismamê min swarî poroye
Serê sê şev û sê rojî temame
Mehvanê Hewlanê Erebe

Bi qedrê Xudê li binê Behrêye
Hey lo .. lo li binê behrêye.

M. Mayi

## Xwêndewanên Serdema Nû re

Ji ber nebûna kadira zaravê kurmanciyê jorin û alîkarî nekirina nivîskarên wê zaravê em pir mixabin, naçar bûn ku hejmarê 29 de beşe kurmanciyê jorin li Serdema Nû rakin.

Em hêvîdarin ku rojnamayên bi zaravê kurmancî jorin dinivîsinin bikanin wê walayetî tijikin.

بۆ ئاگاداری

زۆر بە داخەوە ڕادەگەیەنین کە لەبەر بێ کادری زاراوی کرمانجی ژووروو، وە هاوکاری نەکردنی نووسەرانی ئەو زاراوەیە، سەردەمی نوێ بڕیاریدا لە ژمارە ٢٩وە، بەشی کرمانجی ژووروو ڕاگرێ. هیوادارین ڕۆژنامە وگۆڤارەکانی کە بە زاراوی کرمانجی ژووروو دەردەچن، ئەو بۆشاییە پڕ کەنەوە.

سەردەمی نوێ

## پێک هاتنی بەرەی کوردستانی

لەو کاتەدا کە ڕۆژنامەی سەردەمی دەچوە ژێر چاپ، هەواڵی پێک هاتنی بەرەی کوردستانیمان پێ گەیشت. بە گوێرەی هەواڵێ کە پێشتوو شەش حیزبی سیاسی کوردستانی عیراق (حیزبی دیموکراتی کوردستان، یەکێتی نیشتمانی کوردستان، حیزبی سوسیالیستی کوردستان، حیزبی دیموکراتی گەلی کوردستان حیزبی سوسیالیستی کورد و حیزبی کومونیستی عیراق بەرەیەکی یەکگرتوویان پێک هێناوە. ئێمە لەگەل پیرۆزبایی لەو هەنگاوە پیرۆزە، لە ژمارەی داهاتوودا هەواڵی تەواوی پێک هاتنی ئەو بەرەیە بلاو دەکەینەوە.

Serdema Nû
TRYCK: ARARAT TRYCK
XWEDÎ:
Dr. Cemşîd Heyderî
BERPIRSYAR& REDAKTOR:
Kerîm Hussamî
Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412
P.O.BOX 7066
16407 KISTA
SWEDEN

# Serdema Nu

*Rojnameke siyasî, candî û civakî ye*

Sal 3 Hejmar 28 Gulan 1988 10skr.


## AXIVTINA BÊ MESOLÎYET

Tevgera rizgarixwaza kurdi gehiştiye pilek (derece) giring, tekoşina partên siyasi, çelengiyên pêşmergên qehreman û hêza çekdara Bergirî Millî, fidakarî û li berxwedana xelkû gundiyên gelê me, wan karek wilo kir, ku roj bi roj tevgera rizgarixwaza kurdi geştir û pitir deng bide û bala komel û civinên cihanî ji bo pirsa kurdî rakêsa. Îro ji caran pitir li derve, li ser pirsa kurdi dinivisin û behs lê diken ku êdî destgehên dewletî di nava netewên hevbûyî de nikarin vê pirsê bi pişt guhan ve pavêjin li hember cinayetên hukmetên faşist û diktatorên Irak, Iran û Tirkiyê xwe bê deng bikin.

Di vi warî de, çend kurd hene ku ji zode li Ewrupa û dûr ji welat mane, ew bêy ku haya wan ji serûberên nav welatî hebe û bêy wan têkilî bi derd û janên gel re hebe, ew car car li ser rûperên govar û rojnaman de li ser pirsa rizgarixwaza kurdi dinivîsin bi zimanên Ferensi, Engilizi û civinan girêdidin, behsa pirsa kurdî dikin û li ser barûdoxên (Kawdanên) Kurdistanê dipeyvin.

Rujnama "På Lätt Svenska" di hejmara 4 junawry 1988 an de, ji zardevê pirofisor Îsmet Walî ku ji bo civeinekê li ser pirsa kurdi hatibû Swêd, nivisiye:-

"Wanli" dibêje:-

"Her dem kurd li Îranê wek kurd qebûl kirine. Îro ji li Îranê xelk bê zehmet dikar kurd bin. Li Bajarê Wirmê TV ya kurdî heye. Pirograma kurdi belav dike. Di sala 1979 an demî Xumênî dit û eloitinê ew hizra Îslamê dike. Ew serxwebûn û demokretikê ji kurdan re naxwaze. Lê serûberê kurdan li Îranê baş diçe, ger kurd Îslametiyê qebûl bikin."

Di vir de çend pirsiyar dihêne pêş ku nabe mirov behsa wan neke:-

1- Kenjî li Îranê kurd wek netewe naskire ku mafên xwe yên netewî, zimanî xak (ax) û av û resm û abûriya xwe be? Erê gelo ma kurdnaskirin her hinde ku jêre bêjin "Kurd" û ji hemî mafên xwe bê par bin, yan ji kurdnaskirin ewe ku wek netewekê serxwebûnê jêre bidin wek millet binasin?

2- Qey TV ya bi kurdî li Wirmê pirograma belav dike, idî kurd bi mafên xwe gehişt û dikare bêjê (ez kurdim?). Eger we be, li Iraqê Radio, t.v. û rojname û govar bi kurdi wişene (Zorin), lê li wir gelên ji navbirina kurdan û kai ubûna Kurdistanê li netewame dibin.

3- Ma qey kurd li Îranê musilman ninin, de ku Ismat Şerîf Fermandên Xumênî bibêjê ku:-

"Eger kurd li Îranê Îslamê qebûl bikin, wê

R.3

## KURD LI BER SIYASETA NEHELAN Û JI NAVBIRINÊ



Şerê Iran, Iraqê, yan ji şerê ji nav birina kurdan!

Tişteştek eşkeraye ku şer şêwa mezina hevrikî û neyariyê ye ku nikaribe bi rêyên siyasaî û aştî û çara wê bikin.

R.2

## ÇARESER KIRINA SIYASÎ YA PIRSA AFGANISTANÊ

Di dema 8 salên bûrin de, doza Afganistanê ne her ziyanek giyanî û malî li xelkê wî xist, lê wisa ji têkilyên dinavbera Afganistanê û pakistanê de têkdan. Her çend hukmeta Afganî di demek pêş niha de, pirograma ya millî da xweya kirin, bo demekê livinên eskerî rawestan û daxwaz ji mişextia reviyên Afganî kir ku ew biziurin bo welat û bevbeşî karê ava kirin û pêşde birina welat bin. Lê serokên ku (binav) navê wan-Mucahidên Afganî-yên ku man û berjewenda xwe di şerê birakujiyê de dibinin û her yekî ji wan serê wî bi rijêmek kevneperesta deverê emperyalizma Emrîkî ve girêdayî ye rijêma Îslamiya Îranê ji alikariya wan dike, lew ma naxwan şerê bira kojî dawî bibeû xelkê perişanê Afganistanê bi tenahî û aştî biji.

Dawiya wê, piştî şeş salan axivtina ne rasturast dinavbera du dewletên Afganistan û Pakistan de ku li jêr çavdêriya harikarê sekreterê giştî yên komela netewên hevbûyî dikir, roja 14 april biryara çareserkirina siyasî ji bo pirsa (mesela) Afganistanê hate mor kirin. Ev biryara ku sekreterê netewên hevbûyî serperiştiya wê dikir û wezîrên derve yên Emrikî û Sovyetê têde beşdar bibûn pêkhatiye ji:-

Biryarderê narbera dewletên Pakistan û Afganistanê di warê peywendiyên hember û dest werdanên barê nawxwe yê hevdu û lêdana hevdu.

- Rêzgirtina mafên desthilatdarî û serbixweya siyasî temamiya hevdî û asayiş û parastina kultora netwî ya xwe.
- Rêzgirtin li mafên herdu ji bo gurina nizama siyasî, abûrî û ferhengî (çandî) û kumelatiya xwe.
- Pêşde birina têkiliyên navnetewî di bikar anina desthilata dayimî biser kangayên xwe yên siroştî de li gor irada û viyana xelk û desttêvedanên biyanî.
- Xwe parastin ji gef zordariye bi her şêwekî li ne neskirina sinorê hevdu.
- Xwe parastin ji testvedan ji bo guhrina rijêma siyasîya hev du û tekelava têkiliyên layên biryarder.
- Dil rebetiya hevdu ji wê ku axa her yek ji wan ji bona têkdana desthilat û guhrina rijêma alê din û qaliba siyasî bikar ne ine.
- Xwe parastin ji dest têwerdana çekdarî yan dagîr kirina eskerî yan şêwek din yan dexalet di kar û barên siyasî û abûrî yên hev du de.

Di parçeke qerardarê de ku tekilî bi dest ve berdanên Emrika û Soviyet ve gotiye:-

Du dewletên Emrika û Sovyet bi nişandana piştevaniyê li komar Afganistan û komara Îslamî ya Pakistan û alikariya wan ji bo armancên wan dewletan û bi rêz lê girtina wan bo, mafên desthilatkarî, serbixweyî, temama erdî û bê hyenîya wan, ew sozê didin

R.3